ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:51 PM Page 12

Herwiha Şêx Memdû'hê Birîfkanî li pêşîya vê dîwana Şêx Nûreddînê Birîfkanî pêşgotinek bi zimanê 'erebî nivîsandîye di gel binereha Şêx Nûreddînê Birîfkanî û kûrtejîyana wî kû digehe Şêxê Mezin Şêx Şemseddînê (Xelewatî) kû 'terîqa olî ya wî bû, yê (Qutub) kû leqebê wî bû, yê (Exlatî) kû ji wêderê hatîye, "Xelat" yan "Exlat" bajêreke dikeve ser qera'xa be'hra Wanê yê bi ser Bidlîsê ve, yê (Birîfkanî) kû binecihê Şêx Şemseddînê Exlatî û cihê şêx û meşayixêt qedirgiran bûye.

Pêtivîye bizanîn, kû Şêx Memdû'hê Birîfkanî helbestên bapîrê xwe Şêx Nûreddînê Birîfkanî li gûr pîtên (herfên) ebcedî bi rêz kirîne. Herweha di rûpelek serbixwe da berhemên Şêx Nûreddînê Birîfkanî nivîsandîne piştra çarmalkî û pêncmalkî û şeşmalkîyên wî li ser helbestên Şêx E'hmedê Cizîrî û helbestên bapîrê xwe yê çarê Şêx Şemseddînê Exaltî yê Birîfkanî û herwiha pêncmalkîya wî li ser helbesta Nûreddîn el-Şûnî, kû bi zimanê erebî ye û piştra dawîya dîwanê nivîsandîye.

Ji bilî destnivîsa Şêx Memdû'hê Birîfkanî ez li dû gelek destnivîsên din jî çûm wekî destnivîsên Şêx Mehemmed Tahir Mustefayê Birîfkanî, herwiha destnivîsên Mehemmed Selîm Çelkî ji bû wergirtin û ronkirina pitir înformasyonên kû li ser Şêx Nûreddînê Birîfkanî werbigrim herwiha ji bû dûrxistina şaşîyan di nav helbestên wî da.

Cihê daxê ye kû heta vê serdemê kû 200 sal derbas bûyîn bi ser Şêx Nûreddînê Birîfkanî, helbestên wî bi awayekê temam û tekûz û dûr ji şaşîyan nehatine belavkirin. Dibe kû ew destnivîsên kû li ber hatibûn nivîsîn, bi awayekê rast û durust nehatibûn wergerandin, lewra bi çapeka şaş hatine belavkirin.

Bi vê çendê ev berhem bi min were zengînîyekê didete kelepûrê edebîyata me ya kurdî, herwiha zimanê kurdî. Di nav van helbestan da hemî çîn û taxa ji edeb û felsefe û felek û lahûtê pir e û zengîn e, lewra dibîte pêderek ji bû her xwendevanekî bixwazît mifayê jê bigirît û berew yavakirina hizr û texmînêt xwe biçit. Hewlek pir mezin me daye kû ev berheme dûr ji şaşîyan bêne çapkirin, lê her çawa bit, bibîte pêngavek ji bû paşerojê kû tevî helbestên Şêx Nûreddînê Birîfkanî piştî civandin û komkirina tev destnivîsên li ser hatine nivîsîn, û bi şêweyek

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:51 PM Page 13

baştir mifa ji vê û ji wan bête kirin û bêne çapkirin.

Ji bilî jînenîgara Şêx Nûreddînê Birîfkanî û ji bû pitir naskirina vê malbatê û binemalê ez kurtejîyana Şêx Şemseddînê Exlatî yê Birîfkanî ku bapîrê çarê yê Şêx Nûreddînê Birîfkanî ye û herwiha kurtejîyana Şêx 'Huseynê Exlatî ku bapîrê 11 yê Şêx Nûreddînê Birîfkanî ye, ya kû Şêx Memdû'hê Birîfkanî bi xwe li dawîya herdu dîwanên Şêx Nûreddînê Birîfkanî û Şêx Şemseddînê Exlatî yê Birîfkanî nivîsandibûn di gel rojbûn û mirina her endamekî di vê binemalê da di gel secereyek berfireh her di vê dîwanê da çap dikim.

Herwiha ji bû paşerojê ez kopîya orjînala vê destnivîsa kû Şêx Memdû'hê Birîfkanî nivîsîye, di nav vê dîwanê da çap dikim. Eger şaşîyek di vê çapê da hebit, xwendevan dikarin vegerin destnivîsê bi xwe, dakû ji wan re bibe jêder.

Şêx Nûreddînê Birîfkanî nêzîkî 33 berheman heye, yên kû heta niha em pê dizanîn, herwiha sê dîwanên helbestan bi sê zimanan - zimanê zikmakî yê kurdî, û 'erebî û farisî nivîsandîne. Hêvîdarîn li paşerojê em bi temamî wan jî bideyne çapkirinê.

Koça dawî ya Şêx Nûreddînê Birîfkanî hatîye dîtin di nav destxeteke kevin da bi navê (El-Mewlûd) ya kû seyid Ebdûlla kurê seyid Mustefayê Birîfkanî yê 'Huseynî kû nivîsîye li ser destê seyid 'Husameddîn kurê seyid Me'hmûdê Birîfkanî yê 'Huseynî ku tê da gûtîye: "Ev pirtûke temam bû li wê sala şêx û mûrşidê me seyid Nûreddînê kurê Şêx Ebdûlcebarê Birîfkanî çûye ber dilovanîya Xwedê. Sal 1268 hicrî (mewtûhû fî el-Şehir el-Mûbarek rabî'i el-axir fî yeûm el-e'hed fî tis'e el-ewel mîn el-şehir senete 1268 hicrî).

Şêx Nûreddînê Birîfkanî li gundê Birîfka çûye ber dilovanîya Xwedê û li wir hatîye veşartin. Mezarê wî heta vê serdemê jî tête zîyaretkirin û ev mezargehe ji layê binemala şêxên Birîfkanve hatîye nûjen û avakirin. Gundê Birîfka dikeve bakurê rojhilata bajarê Mûsilê û tête hesabkirin di gel qeza Şêxan û 44 kîlomêtran ji bajêrê Mûsil dûr e û niha rêyek nû ji bajêrê Dihûkê yekser heya Birîfkan çêkirine, nêzîkî 15 kîlomêtra jê dûr e. Herwiha li gor jimartina ebcedî ev salmirina Şêx Nûreddînê Birîfkanî ya kû di nav destxetek kevin da hatîye dîtin ya dirûst

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:51 PM Page 14

e, rêza helbestê kû yek ji mirîdên wî nivîsandîye, gûtîye:

**"Tebkî el-semaû lîfeqdî el-Nûrî lîlesefî".**

Wekî me gûtî, ev rêza helbestê bi jimartina ebcedî dibe 1268 hicrî sala koçkirina Şêx Nûreddînê Birîfkanî.

Xwe bêguman, da kartêkirina van helbestan pitir bit ger di dema xweda hatiban weşandin, lê herwekî em hemû dizanin li Îraqê jî mîna perçeyên dî yên welatê me hukumetên desthilatdar rê ne didan çapkirin û weşana berhemên edebî yên kû bi canê welatparêzî û Kurdistantîyê di aviz û dagirtî bûn. Di ser hindêra jî çend helbestên şa'irê bi nav û deng Şêx Nûreddînê Birîfkanî di rojname û kovaran da dihatine belavkirin.

Bi vî berhemê hêja hîvîdarim, kû şîyabim xizmetekê bigehînime edebîyata me ya klasîka kurdî, daku mifa jê bête girtin û xwendevanên kurd û yên bîyanî bi dîtina wê şad bin û çavên xwe pê kil bidin.

*Zahid Şêx Memdû'hê Birîfkanî*
*Swêd 20.10.2000*

## Pêşgotina Şêx Memdû'hê Birîfkanî
## (Mûqeddîmet el-Şeyx Memdû'h el-Birîfkanî)

Haza mecme'i min dîwan qu'tub el-zeman we 'xews el-ewan seyidî we qudwetî we fexrî we melazî îla E'llah el-seyid el-şeyx Nûreddîn el-Birîfkanî qeddese sîrrehû we efa'ze 'eleyna fey'zehû we enwarehû we bîrrehû, el mûtewefî fî senete 1268 hicrî fî qerîyetî Birîfkan ra'zîye'llahû te'alla 'enhû, 'herrere haza el-dîwan bîqelem xadim e'itabîhî we sûccadetîhî (fî senet 1940 îfrencî) el seyid Memdû'h îbn el-seyid Mu'hsin îbn el seyid 'Ebdûlcebar îbn el seyid 'Ebdûlqehar îbn el seyid 'Ebdûlla şeqîq muelif sahib el dîwan îbn el seyid 'Ebdûlcebar îbn el seyid Nûreddîn îbn el seyid Ebûbekir îbn el seyid Zeynûl'abidîn îbn el seyid el şeyx Şemseddîn el qu'tub el Xelewatî el meşhûr bîced sadat Birîfkan cemî'en, ellezî cae mîn Exla't îla Birîfkan wellezî lehû dîwanûn 'ecîb bîllû'xetîl Kurdîye welakîn lem yeqe'i fî yedîna 'xeyr cûzûi qelîl mînha, re'zîye'llahû te'ala 'enhûm cemî'en, weînşae'llah sewfe nektûbûha 'heseb 'hirûf el-hîcai fî haze el-kîtab me'e baqî nesebîhî îla en yetta'sîle bîceddîhî el-'Huseyn şehîd Kerbelai re'zîye'llahû te'ala 'enhû we 'enhûm cemî'en, îbn el-seyid 'Ebdilkerîm îbn el-seyid Mûsa îbn el-seyid Suleyman îbn el-seyid 'Ebdûl'xenî îbn el-seyid Îs'haq îbn el-seyid Babaman'sûr îbn el-seyid el-Şeyx 'Huseyn el-Exla'tî el-Meşhûr el-Mûteweffî bî Misir senet 808h. - 1405z. îbn el-seyid Ebû el-'Hesen ('Elî el-Xelewatî) îbn el-seyid 'Hacî Nîzameddîn îbn el-seyid E'hmed el-Exla'tî, îbn el-Şeyx Zeynûl'abidîn 'Elî el-Zûrdanî el-Mûwe'hid el-Xûrasanî el-seyid el-Emîr el-Meşhûr bî ('Elî el-Hemedanî) ced sadat Exlat Qeddese sîrrehû el-'Ezîz.

*Memdû`h el Birîfkanî*

## Binereha
## Şêx Nûreddînê Birîfkanî
## (1205 - 1268h.) (1790 - 1851z.)

Zanayê sofî yê bi nav û deng **Şêx Nûreddînê Birîfkanî** kurê **seyid Ebdûlcebarî** (sal 1231h. kûç kirîye û li gundê Îtûtê hatiye veşartin) kurê **Şêx Nûreddînî** (sal 1195h. kûç kirî) kurê **seyid Ebûbekir** (sal 1158h. kûç kirî) kurê **seyid Zeynûlabiddîn(1)** (yê kû di navbera 1035 - 1119h. jîyaye) kurê zanayê sofî anayê bi nav û deng, kenkenê demê xwe **Şêx Şemseddînê Qutbê Xelewatî yê Exlatî yê Birîfkanî(2)** ye, yê ku li sala 997ê hicrî - 1588 zayînî li Exlatê ji dayîk bûye û sala 1085ê hicrî - 1674ê zayînî li Birîfkanê kûç kirîye. Kurê **seyid Ebdilkerîmê Exlatî** kurê **seyid Mûsayê Exlatî** kurê **Silêmanê Exlatî** kurê **Ebdul'xenîyê Exlatî** kurê **Îs'haqê Exlatî** kurê **Babamansûrê Exlatî** kurê (Kemal el-Mûlle wel dîn) **Şêx 'Huseynê Exlatî(3)** yê navdar, yê ku sala 808ê hicrî (1405ê zayînî) li Misirê kûç kirî, yê kû navdar e di nav 'Ecem û 'Ereb û Kurdan da, di wê sala kû Teymûr Leng kûç kirî, ew çûye ber dilûvanîya Xwedê. Kurê **Ebûl-Hesen 'Elî yê Xelewatî yê Exlatî(4)**, yê ku sal 781h. kûç kirî, kurê **Hacî Nîzameddînê Exlatî** kurê **E'hmedê Exlatî(5)**, kurê **Zeynûl'abidîn 'Elîyê Zûrdanî** yê Muwa'hidê Xorasanî(6) yê Bûzincî(7) yan (Bozincirdî) yê Hemedanî ye, ku sala 685ê hicrî kûç kirîye. Kurê **Salihê Hemedanî** kurê **Yûsifê Hemedanî** kurê **Selîm** (Ebû Mûslim el-'Iraqî el-Hemedanî) kurê **Yûsifê Hemedanî** (Eba Ye'iqûb, yê kû sal 535h. kûç kirî)(8) kurê **Eyûbî** kurê **Mihemmed Yûsif** yê navdar e bi (**'Sedreddîn**), kurê **Celaleddîn 'Huseyn** kurê **Zeynûl'abidîn** (Ebûl-Mueyyed 'Elî Şu'eyb), yê ku (Bi Zuhre yan Bohre) navdar e. Kurê **Ce'ifer** (Ebûl-'Heres) kurê **Muhemmed** ('Ebû Ce'ifer el-Re'zewî) kurê **Me'hmûdî** ('Ebû Muhemmed el-Re'zewî) kurê **A'hmedî** (el-Teqî el-Re'zewî) kurê **Ebdûllayî** (el-Mûntexeb el-Re'zewî) kurê **'Elîyê** (el-Muntexeb el-Mûnteqî el-Mûxtar wel îmam el-Neqîb bî Be'xdad) kurê **Îmam Ce'iferî** (el-Zekî el-Mû'seddeq, sal 272h. kûç kirî) kurê **îmam 'Elîyê Hadî** (el-'Eskerî, sal 254h. kûç kirî) kurê **îmam**

**Muhemmed Cewadî** sal 220h. kûç kirî, kurê **'Elîyê Ri'za** sal 203h. kûç kirî, kurê **îmam Mûsa bin Ka'zim** (el-îmam Mûsa el-Ka'zim, sal 184h. kûç kirî) kurê **îmam Ce'iferî** (el-'Sadiq, sal 148h. kûç kirî) kurê **îmam Muhemmed Baqirî,** sal 114h. kûç kirî, kurê **îmam Zeynûl'abidîn 'Elîyê Sûccad** (el-Sûccad, sal 38h. ji dayik bûye û sal 95h. kûç kirî) kurê **îmam 'Huseyn** (Re'zîyye e'llahû 'enhû (el-Şehîd, sal 61h. kûç kirî) kurê (**Fa'tîme el-Zehrai el-Betûl** sal 11h. kûç kirî, keça **Mu'hemmed** 'se'llû'llahû 'elleyhî wesellem, sal 10h. çûye ber dilûvanîya Xwedê).

**Perawêz:**

(**1**) Şêx Zeynûl'abidîn: kurê çarê yê Şêx Şemseddînê Exlatî ye, li serdema xwe da qazî bû û ew bapîrê seyidên Birîfkanê û binemala Nûrî û Şêstnavdîn û binemala 'Xezalî ye. Wî sê kur hebûn - 'Huseyn bapîrê binemala Şêstnavdînî. Ebû Bekir bapîrê binemala Birîfkanê û binemala Nûrî ye. 'Xezalî bapîrê binemala 'Xezalî ye.

(**2**) Şêx Şemseddînê Exlatî: ji koka xwe ji bajarê Exlatê ye, di serdema wî da şer bû li navbera dewletên Osmanî û 'Sefewî da, bû egera kavilkirina bajarê Exlatê, ew jî yek bû kû çûbû Hekarîya bû cem sultan 'Îmadeddînê Hekarî, yê kû hakim bû li Hekarî heya sala 1049 h. - 1639z. Ew digel koçerbûneka eşîra ertûşîya gehişte devera eşîra mizûrîyan li Başûrê Kurdistanê li sala 1620 z. li serdema hakimê Amêdîyê {Sîdî xan} û wî heft gund dîyarî Şêx Şemseddînî kirin ji bû belavkirina rêça sûfîtî ya Xelwetî û tekiya xwe li Birîfkan dana. Ji nevîyên wî yên navdar Şêx Nûreddînê Birîfkanî ye.

(**3**) Şêx 'Huseynê Exlatî: zanayek bi hêz bû di 'ilmê ('Zahir û Ba'tin) û li serkêşîya 'alimêt zemanê xwe bû di zanîna ('ilm el-Cefer).. Dema kû zanî leşkerên Cengîzxanî bi talanên mezin radibin li Îranê û Turkîstanê - Tûranê û berew Exlatê va tên ew di gel 12 hezar binemalan ji mirîd û dûst û mirûvên xwe li sala 790ê hicrî ji Exlatê bar dikin berew welatê Misrê diçin. Li wêderê di sala 808h. - 1405z. koç dike. Û heta vê serdemê jî taxek heye bi navê taxa Exlatîyan li Qahîre, tekiya û mezarê Şêx 'Huseynê Exlatî lê heye, mirîd û mirûvên wî bi navê Şêx 'Huseynê Exlatî nav kirîye.

(**4**) Ebûl 'Hesen 'Elî: li ser gotina Ebdûlkerîmê Mûderis di pirtû-

ka xwe da ya bi navê (”Binemaley zanyaran”, rûpel 432) navê Ebûl ’Hesenî bi vî awayî nivîsîye: Seyid û îmam û şêxê Mûrşid Şeyxûlîslam ’Elî, yê ku sala 915a hicrî koç kirî. Ev salmirina ku Ebdûlkerîmê Muderris nivîsandî, şaş e û ya durust (Ebûl ’Hesen ’Elîyê Xelewatî ku rêça wî ya olî bû, yê Exlatî ye, yê kû sal 781 hicrî koç kirîye), wek Şêx Memdû’hî nivîsandî û dibêje ew li serdema şahê Neqşebendanî jîya ye û ev şahe sal (719) hicrî ji dayîk bûye û sal (791) hicrî koç kirîye. Li cihek din Ebdûlkerîmê Mûderis behsa secereya binemala Birîfkan weha kirîye. Ev secere û neseb li ber pirtûka bi navê (”Îrşad el-Salikîn fî ’terîq el-’Arifîn”), kû yek ji bapîrên vê binemala Birîfkanê, ew pirtûk nivîsandîye û têda navên endamên vê binemalê bi giştî nivîsandine. Û herwiha Şêx Memdû’hê Birîfkanî ev secera binemala Birîfkan di dawîya dîwana Şêx Nûreddînê Birîfkanî û dîwana Şêx Şemseddînê Exlatî yê Birîfkanî nivîsandîye. Ev herdu dîwanên helbestan Şêx Memdû’hê Birîfkanî bi destxeta xwe di navbera sala 1940 - 1966 ê zayînî nivîsandîye. Û li dawîya wan dîwana înformasyonên giring li ser vê binemalê ji dayikbûn û koçkirina her endamekî ji vê binemalê (di meha mu’herrem sal 1389h.) nivîsandîye.

(5) Seyid E’hmedê Exlatî ew e yê ku navdar e bi bapîr û mezinê seyidên Exlatê û Birîfkanê. Yekemîn kes bû ji bajarê Hemedanê barkiriye û hatiye Exlatê li ser gotina babê xwe Seyid Zeynûlabidîn ’Elîyê Zurdanî yê Hemedanî yê Xorasanî sala 682 ê hicrî bar kirîye Exlatê jibû belavkirina rêça xwe ya olî (terîqa Sehrwardî). Ev barkirina E’hmedê Exlatî di serdema sultan Tikûdar kurê Holakû xan kurê Tolxan kurê Çengîz xanî bû, piştî nemana ’Ebbasîya ji Bexdadê û herwiha Eyûbîya.

(6) Zeynûlabidîn Elîyê Zûrdanî ew e yê ku bi navê (seyid û mîrê mezin Şêx Zeynûlabiddîn Elîyê Zûrdanî yê Hemedanî yê Xorasanî) navdar e û di serdema xwe da mîrekî mezin bûye.

(7) Bûzincê yan Bûzincirdî: gundek e ji gundên Hemedanê li Îranê.

(8) Yûsifê Hemedanî (eba Ye’iqûb): yê navdar e bi babê Ye’iqûbî li sala 440 yan 441 hicrî li Bûzincê (fî rebî’i el-ewwel), li Bîyamîn kû dikeve navbera (Herat û Ne’işûr) hatiye ser dunyayê û li sala 535 hicrî piştî kû 95 salan jîyay, çûye ber dilovanîya Xwedê û li (Merv), kû bajêrek e li Xorasanê, li wir hatiye veşartin. Li ser gotina seyda ’Huseynê Xelîqî, kû bi xwe mezarê wî li Merv dîtiye.

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:51 PM Page 19

## Jîyannameya
## Şêx Nûreddînê Birîfkanî

Şêx Nûreddîn li gundê Birîfka sala 1205 mişextî hevbirê 1790 zayînî hatiye ser dunyayê. Ji binemalek xanedan û navdar û ji xudê tirs û di sûfiyatiyêde peyawirk bûye. Ev xanedan û binemala bi nav û deng li devera Behdînan û li her çar kinarêd wê li Kurdistanê navdar e. Bapîrekê wî Şêx Şemseddînê Exlatî yê Birîfkanî bûye, yê ku ji kenkene û fêhris û helketêt kurda binav û deng bûye, ji ber vê çendê ne dûre her ji zarûkînî rêya ji xudêtirs û sofiyatiyê girtibît ku li ser rewişt û kar û kiriyarêt binemalê çubît. Heta ku gehiştiye wê peyîska bilind ya ku gehiştiyê ku nav û dengêt wî çûyîn.

Şêx Nûreddînê nemir di jîyê 10 saliyê de Quran jiberkiribû. Piştra wekî hemî şagirtêt din rêya xwandinê li cem gelek zana û ronakbîrên wî çaxî di devera Behdîna xwandîye, heta ku şehadetnameya zanayî di hemî layan de wergirtîye. Ji wan zana û ronakbîrên berketî û navdar, zanayê bi nav û deng mamostayê wî seyda Mela Yehiyayê Mizûrî, herwiha Şêx Abdulwehab Şûşî û Şêx Abdulre'hman Efendî Eldeba'x, miftîyê bajarê Mûsilê, piştra çûye nik Şêx Me'hmudê kurê Abdulcelîl Elxu'zrî yê Musilî yê ku bi navê (Eba 'Elî) navdar e, destûriya belavkirin û rêberiya Terîqa Qadirî ji wî wergirtiye û kincê sofyatiyê yê ku dibêjinê "Xirqe" kire ber xwe û rêya Birîfka girteve. Piştra dest bi belavkirina rêça Qadirî kirîye û karî di demekê kêm de (Lîwai el-Mû'sil) û Hewlêrê, û li nav deverên koçeran û li nav gelek cihwara li deverên Turkiya ev rêça olî belav biket. Hijmareka yêkcar zor bûne mirîdên wî.

**Ji xelîfên wî yên navdar ku ji binemala wî evin;** kurê birayê wî Şêx Muhemmed kurê Şêx 'Ebdullah yê Birîfkanî, Şêx 'Ebdulhemîd xan Etruşî û Şêx 'Elîyê Gelî Rimanî û Şêx Mustefa kurê Şêx 'Hesenê Birîfkanî û seyid 'Husameddîn kurê seyid Me'hmûdê Birîfkî û seyid 'Ebdullah kurê seyid Mustefayê Birîfkî û Şêx 'Ebdûlletîfê Birîfkanî û Şêx 'Hemad kurê Şêx 'Ebdulcelîlî kurê Şêx 'Hemadê Birîfkanî.

**Herwiha ji xelîfên wî yên navdar:** Şêx Muhemmed el-Nurî el-Mu'silî, Şêx seyid 'Usman Efendî el-Ri'zwanî, Şêx Îslam el-Şûşî, Mela 'Hamid Efendî kurê 'Îsayê Duskî yê Bêsirî, Şêx 'Ebdulkerîm 'Eqrawî, Şêx Mustefa el-'Umadî, seyid A'hmed el-Seb'awî, Şêx Taha kurê mela Teyîbê Silêvanî, Şêx 'Hesen el-Cebar el-Mûsilî, Şêx 'Elî el-Me'xribî, Şêx 'Ebdulre'hman el-En'sarî el-Cizîrî û el-'Hac 'Ebdu'llah el-Fey'zî, Şêx 'Ebdulfeta'h el-Zaxûlî, Hac 'Sali'h Çilmêran, şêx 'Sultan xelîfe, Şêx 'Ebdulbarî el-Circanî el-Wanî.

Şêx Nûreddîn di hersê layêt ronakbîrîyê de zana bûye.

Ji layê xudêtirsîyê û musilmanperweriyêve lê mêzebikey, dê bînî ku bêguman ji şêxên fêhris û kenkenêt bi bizav û bi rahavêj bûye, ne ku bi tenê li devera Badînan, lê belê li hemû Kurdistanê jî. Eger ji aliyê danayî- 'ilmî- zanayî û ronakbîriya wî dem û çaxîve jî lê binêrî, dê dîsa jî xuya be ku ji serkêşêt berketî û xwedî nav bûye. Ji ber şarazayî, pisporî û melevaniya wî, gelo ev yek bi çi eşkere dibe ku ew pir şareza û peyîsk bilind bûye? Ev fêhris kenkeneyî û peyîskbilindîye bi berê mejî û mejkutikê wî, bi pirtûkên xwedê jê razî nivîsîn ji hemû reng û awayên danayî û ronakbîriyê, nemaze bi sofiyatiyê û wan rêyêt divêt bigirin û li ser biçin, lê mixabin sed mixabin gelek berê destî ankû kitêbên nivîsîn nemane, pûç û pelaçe bûyne.

Helbesta Şêx Rizayê Telebanî ya ku bi navê Birîfkan çêtirîn girûveye bû vê rastîyê. Wekû dibêjît:

**'Ezmê dîyar çû kerdem zi Şehrezûr**
**Eftad der dîyarê (Birîfkan) mera 'ibûr**
**Kûhî bûlend payê der an rehguzar bûd**
**Bigudaxtê zi tabê tecella bisanê 'tûr**
**'Heyran şudem zi neşieyê an kûhê pirşikûh**
**Perwaz kerd ez serê men 'taîrê şi'ur**
**Awaz kerd nagehim ez hatifî zi 'xeyb**
**Kayin raz ber tu le'hzeyê dîger kuned 'zihûr**
**Zi an kûhê nîkbext çû bala ber Amedem**
**Binmûd çûn rewaqê felek gûnbedî zi dûr**

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:51 PM Page 21

**Pûrsîdem în rewaqê mûnewer ez anê kîst**
**Tex tex tebarekûllah ez în cinet û qisûr**
**Manendê qursê enver zerrîn aftab**
**Mî taft zi bameş lemi'e lemi'e nûr**
**Guftend în 'zerî'hê qutbî zi ewliya est**
**Bênimûdê saqîyê ezeleş badeê 'tehûr**
**În merqedê 'hebîbê xuda (Şêx Nûrî est)**
**Çeşmeş bê xak xuftê û can reft der xitûr**
**Ayend fewc fewc zi behirê ziyareteş**
**Ez asiman melayîk der 'sûretê 'tiyûr**
**Sazed xuda bi sayeyê cemşîd ber tereş**
**Mûrî eger bi sayeyê qesreş kuned mûrûr**
**Ya reb bicah û hurmetê în qutibê ewlîyai**
**Curmê (Ri'za) bi bexş kêfermûd enal'xefûr**
**Rûzî mekûnd der în sefereş renc û mê'hnetî**
**Baz avereş bi şadî û asayiş û sirûr.**

Şêx Nûreddîn ji desteka yekê ji rewşenbîrêt Behdînan digire, herweha di hemû aliyên danayê olî ('ilmî) û rewşenbîrî ya giştî de şareza û melevan bû, lê navê wî bi sofyatiyê pitir belav bibû. Herwiha Xwedê jê razî Şêx Nûreddînê Birîfkanî ji serkêşêt bi nav û dengêt desteka sêyêye jî, ji ber ku gelek dîwanên berketî yên ku ji helbestên berketî û pir me'ina û sipehî bi lêkînan û dariştinê vehandîne, bi zimanê 'erebî û bi zimanê zikmakî yê kurdî û bi zimanê farisî. Vehandina helbesta û lêkînana ku bi zimanên 'erebî û farisî û kurdî 'ilmê erûzê ferahîdî bi kar înaye û bi şahrezayî li ser çûye.

Herwiha ji helbestên dîwana Şêx Nûreddînê Birîfkanî ku bi zimanê 'erebî nivîsandîne, şarezayeke giştî di hemî layên danayî û rewşenbîrîyê da li cem hebûyîne, dîyar dibit ku hizr û ray û bîrêt wî di sofîyatîyê da ji Xwedêtirsîyê û rêka olî û ayînî girtîye, di nav wan helbestan da pir xuya ye. Ji ber vê çendê Şêx Nûreddînê nemir zanayekê berketî û danayekê navdarê çax û demê xwe bûye, eger çi bizava wî pitir terxan kirîye bû alîyê

sofîyatîyê.

Şêx Nûreddînê Birîfkanî ev helbesta ku di nav dîwana wî da ya ku bi zimanê farisî vehandî, nimûneyeke ji vî berhemî. Em çend malka bû nimûne li ber çavê xwendevanên hêja rêzdikin.

**Mer'heba ey bûlbûlê ba'xê kuhen**
**Ve zi gulê re'ina bigu bama suxen**
**Mer'heba ey qa'sidê 'teyarê ma**
**Mîdhend herdem xeber ez yarê ma**
**Mer'heba ey hudhudê ferxundê fal**
**Mer'heba ey tutîyê şiker meqal**

Şêx Nûreddînê Birîfkanî Xwedê jê razî, nêzîkî 40 salan li gundê Birîfka karê wî rêya rast û durista Xwedê jêra emir kirî nîşanî xelkî dida û vî karê rewşenbîrîyê û mamostatîyê ku gelek zana û mirûvên maqûl ji mirîd û xelqî ji ber destî derkeftîne û belavî Kurdistanê bûyîne.

Di sala 1268 ê hicrî li gundê Birîfka Şêx Nûreddînê Birîfkanî çûye ber dilovanîya Xwedê û di mezargeha tekîyê da hatîye veşartin û gorê wî yê pîroz bûye mezargehî mirîd û xelqî, ji her çar kinarên Kurdistanê sera didin.

Şêx Nûreddînê Birîfkanî di parçehelbesteke xwe da weha gûtîye:

***Nûrî Birîfkî e'sle ew      Belkî 'Huseynî nesle ew***

***Mela Mehemmed Se'îd Yasînê Birîfkî yê Dihûkî di sala 1970 z. di pirtûka xweda ya ku bi navê "Fû'zelai Behdînan" weha li ser Şêx Nûreddînê Birîfkanî gotîye:***

Şêx Nûreddînê Birîfkî ji mezinên meşaîxên rêça Qadirî bû, belkî yeke ku ev rêçe carek din ji nûhve nûjen kirîye, piştî ku demek dirêj ev rêçe ji binemala Birîfkan dûr bibû. Binemala Birîfkan ji 'alim û mirûvên zana û ji rewşenbîr û Xwedêtirs pirin, belê karên rêçên olî di nav wan da bi wî awayî nebû, lê dema Şêx Nûreddîn xuya bûy, bi rastîya xwe û renc û ze'hmetên kêşayîn, bi wefadariya xwe, ev binemale giş pitir hate naskirin. Şêx Nûreddînî navek pir mezin ji xwe ra peyda kir li hemî deverên Kurdistanê û bingehên rêça Qadirî li Behdînan çêbûn û mirîd û dûstên wî demek dirêj li paş wî li ser belavkirina vê rêçê ji nav vê binemalê û ji xelqê bîyanî berdewam bûn. Û bawerîyek pir mezin di nav devera Behdînan da çêbû û belavî deverên din jî yên Kurdistanê bûn.

Şêx Nûreddînê Birîfkanî gelek mirîd li dor xwe hiştin, ji wan yên ku li bajarê Mûsilê ne (Şêx Mehemmed Nûrî, Şêx E'hmedê Seb'awî û 'Usmanê Ri'zwanî û binemala el-'Ezîzî û gelekên din ji bil wan). Herwiha di nav eşîreta Goyan û devera Wanê ji deverên Tirkî û li Behdîna bi xwe, li Dihûkê û Etrûşê û li nav Rêkanîya jî bi berdewamî seredana mezarê Birîfka ji mirûv û mirîd û xelqên bîyanî zîyaret dikirin. Û ev seredan nedihatin birîn heya gelek salan, bi xwe dema ez zarûk bûm, min ev kûmbûnên komelên ji sedan kesa pêk hatî, ji mirûvên pêbawer û musulman ji Cizîra (girava Îbn-'Omerî), ji deverên Tirkîya qesta Birîfka dikirin ji bû zîyaretê mezarê wî yê pîroz.

Şêx Nûreddînî gelek berhemên hêja nivîsandîne, li ser te'sewifê û edebê û rêçên olî û digel pir warên dinve û ji gişa baştir û nirxtir pirtûka wî ya ku bi navê (El-bidur) ku pir hêja ye û tevî zanist û merîfet û rêkên rast û durust têdane. Herwiha Şêx Nûreddînî gelek helbestên hêja û jîr di nav dîwanan da rêz kirîne bi zimanê erebî, bi zimanê kurdî li cem nevîyên wî peyde dibin, û ew helbest û çîrok di nav derîya te'sewifê û evîndarîyê dagirtîne.